Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :976 | 3-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/


Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165


# Şaredariyên gel yên herêma Cizîrê dest bi projeyên nû kirin

**Şaredariyên gel yên herêma Cizîrê projeyên nû yên xizmetgûzariyê dan destpêkirin û wê riyan qîr bikin û torên kanalîzasyonê sererast bikin.**

Di gelek kolanên bajarê Hesekê de kortik çêbûne û xira bûne. Her wiha li gel bilindbûna pileyên germahiyê, kamyonên bargiran rewşa rêyên xerabûyî xirabtir dikin. Di vî warî de Komîteya Jîngeh û Şaredariyan a bajarê Hesekê dest bi qîrkirina gelek rêyên sereke yên bajêr kir. Serokê Daîreya Fenî ya Hesekê Fehid Îbrahîm got dê gelek rê bên qîrkirin û bi bermehî û kevirên şikandî bên sererastkirin.

Komîteyê di 13`ê Hezîranê de dest bi qîrkirina Rêya Muheleq a rojhilatê Hesekê kir. Piştî qirkirina rê bi 21 hezar metrekab qîr û bi lêçûna 300 hezar dolaran, êdî kamyonên mezin dê di derveyî bajêr re derbas bibin.

Li gorî Fehid Îbrahîm dê rêyên gundên Til Tawîl, Eb El-Şok û Til Ehmer bi bermahiyan bên sererastkirin. Her wiha diyar kir ku dê projeyên wekî sererastkirina toreyên kanalîzasyonê bi dirêjahiya 5 kîmetreyan, sererastkirina peyarê, avakirina rogaran, sererastkirina parkan û piran li Hesekê pêk werin.

### Tirbespiyê



Li navçeya Tirbespiyê jî Şaredariya Gel dest bi projeyên nû kiriye. Di nava projeyan de dê rêyên li navenda navçeyê û gundên girêdayî wê werin qîrkirin. Her wiha dê rêyeke din li bakurê navçeyê bê vekirin da ku qerebalixa di nav navçeyê de sivik bibe û tevgera trafîkê jî hêsan bike.

Cîgirê Hevserokatiya Şaredariya Gel a navçeya Tirbespiyê Nesîm Mûrad wiha axivî: "Piştî civînên bi komînan re rewşa rêyan û binesaziya navçeyê û gundewarên wê hate naskirin, nivîsgehên fenî yên Şaredariya Tirbespiyê û bajarokên girêdayî wê piştî lêkolînê gelek proje pêşkêşî Komîteya Şaredariyan a kantona Qamişloyê kir."

Mûrad wiha pê de çû: "Piştî proje hatin erêkirin û budce ji bo pêkanîna van projeyan ji qîrkirin, sererastkirin û dayîna toreyên kenalîzasyonê, hate veqetandin, Şaredariya Gel a navçeya Tirbespiyê û bajarokên girêdayî wê dest bi van projeyan kir da ku di demsala havînê de bi dawî bike."





Nesîm Mûrad îşaret bi projeyên herî girîng ên Şaredariya Gel kir û got dê rêyekê li bakurê navçeyê vekin ku têketina bajêr li aliyê rojhilat bi têketina bajêr li aliyê rojava girê dide bêyî ku di navenda bajêr re derbas bibe. Her wiha diyar kir ku dê rêya gundê Şelhûmiye Siyasî qîr bikin û toreyên avê yên nû dirêj bikin.

Her wiha di nava projeyan de dê rêyên bajarokên Til Merûf, Meşûq, Hilwe û Ebû Firi bê qîrkirin û sererastkirin da ku tevgera şêniyan di zivistanê de hêsan bibe.

### Çilaxa

Li navçeya Çilaxa û bajarokên girêdayî wê Şaredariya Gel dest bi projeyên qîrkirina rêyan kir. Şaredariyê ji bo sererastkirina rêyên navçeyê û gelek gundan, 2 hezar û 500 metre bermahî veqetandiye.

Li bajarokê Abre Şaredariya Gel rêya gundê Girkê Xilo bi dirêjahiya hezar û 680 metre qîr dike, toreyên kanalîzasyonê li gundê Amarat dirêj dike û rêya gundê Sinan heta bigihêje rêya giştî bi dirêjahiya hezar û 700 metre bi bermahiyan sererast dike.

Şaredariya bajarokê Kêşkê dê rêya di navbera gundê Aliyat û Kevrê Dena de bi dirêjahiya 3 kîlometreyan û bi hezar û 600 metrekab qîrê zîft bike.

***ANHA***

## Festîvala Filmên Kurdî ya Hamburgê filman qebûl dike

**Festîvala Filmên Kurdî ya Hamburgê ragihand ku wê îsal di navbera 26'ê Cotmehê û 1'ê Mijdara 2022'yan de cara 13'an festîvala xwe li dar bixe.**

Festîvala Filmên Kurdî a Hamburgê ragihand ku ew ê îsal di navbera 26'ê Cotmehê û 1'ê Mijdara 2022'an de cara 13'an festîvala xwe li dar bixe.

Kesên filmên wan hene, dikarin heta 16'ê Tebaxê filmên xwe rêkin navnîşana festîvalê.

Ji bo rêkirina lînka filman, navnîşana festîvalê li jêr e: kurdischesfilmfestivalhamburg@gmail.com

Bi riya bernameyên dropbox û wetransferê hûn dikarin filman bişînin.

***Ozgûr Polîtîka***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Arkeolojî** (Fransî) | **Zanista kolanê, şûnwarnasî, vekolîna dîrokê bi riya tiştên ji serdemên berê ve di binê erdê de mayîn û pişt re hatîn dîtin.** |
| **Arkeolog** (Fransî) | Pisporên arkeolojiyê, kesên ku karê wan arkeolojî ye |
| **Baregeh** | Biryargeh, bingeh, navend, merkez, qerargeh, meqer, mekan, cî. Bi giranî di qada leşkerî de bi kar tê. |
| **Jîngeh** | 1. Cihê zindî lê dijîn. 2. Derdor, hawîrdor. Bi taybetî xwezaya li derdora mirovan |
| **Materyal.** (Fransî) | 1. Tişta ji bo çêkirina tişteke din, tişta ku tişteke din jê tê çêkirin. Amûr, alav, pêdivî: Qumaş materyalê cilan e. Pirtûk materyalên dersan in. 2. Çi nivîskî, çi devkî, çi bidîmen her belgeya hatî qeydkirin. |
| **Rêl** | Daristan, dehl, dehlûdir, xerz, bîşe |
| **Sansûr** (Fransî) | 1. Karê venêrîna rêveberiyê ji bo her rengê waşanê, berhemên sînema û tiyatroyê, venêrîna hişk: Qaşo ragihandin azad bû, sansûr rabûbû. 2. Girêdana her rengê weşanê, berhemên sînema û tiyatroyê bi destûrê ve, venêrîna hişk. |
| **Têgeh** | Peyvên ku bi taybetî hin wate li wan hatine barkirin. Waje, wate, têgîn, term |
| **Xweza** | Xurist, surişt, tebîet, natûr |
| **Xwezayî** | 1. Surişţî, xuristî, tebîî, natûrel. Tişta têkildarî xwezayê. 2. Tiştên ne berhemên pîşesaziyê. 3. Asayî, normal. 4. Tişta neguhertî |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | S | B | ■ | B | Î | N | E | R |
| 2 | A | T | A | M | A | N | ■ | L | A |
| 3 | R | E | ■ | Û | R | ■ | P | E | Z |
| 4 | ■ | N | A | ■ | E | Ç | ■ | Z | ■ |
| 5 | A | B | ■ | A | Ş | ■ | L | Î | S |
| 6 | G | O | R | E | ■ | E | ■ | Z | O |
| 7 | ■ | L | O | ■ | E | N | Î | ■ | R |
| 8 | K | ■ | M | E | B | E | S | T | ■ |
| 9 | A | S | A | ■ | A | ■ | A | R | Î |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 2 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 3 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 4 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 5 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 6 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 7 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 8 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 9 | | | | | ■ | | | | ■ |

### ÇEP-RAST

1. Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Serbest, ne kole
2. Bi rûsî erê... Kurtebêja Ksenonê... Boyaxa neynûkan
3. Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Îrade
4. Bajarekî me ku bi sûrên xwe navdar e... Beyreq, sembola welatan
5. Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga ku pê erebe dikişandin an jî cot dikirin... Rojek
6. Awayekî danse, babetek ji şanoya muzîkal... Yekeya giraniyê ku li Fransayê 30,59 gr û li Îngilistanê jî 28,349 gr û li Holandayê jî 100 gr ye
7. Cephe, bere... Sedemkarê tevgerê, paldêr
8. Bizmar... Herf
9. Vê carê... Sir, tiştê her kes pê nizane

### JOR-JÊR

1. Beşeke malê, jûr... Heta hetayê
2. Nasnavê ku berê didan fermandarê kazakên rûs
3. Alif, xwarina sewalan... Paytexta Perûyê
4. Baneşana kêfxweşiyê... Bi erebî "ez"... Plakaya navneteweyî ya Îranê
5. (Derwêşê …) Destaneke me... Baneşana keserê
6. Kanaleke televîzyona kurdî
7. Nexweşîneke çerm e ku bi taybetî di gewde, çîm û rû de wekî kelepotkan xwe dide nîşan... Nîşandeka ku dengan dide xuyakirin, mirov çawa li amûrekê dixe û distrê
8. Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin... Îşaret, şop
9. Profesorê ku ji birêvebirina fakulteyê berpirs e... Birayê bavê mirov

# "Em bi saya keda Rêbertiyê, şehîdan û berxwedana gerîla dijîn"



Têkildarî êriş û gefên dewleta tirkî ya dagîrker, Ebîr Elî Şîtî got, armanca êrişan parçekirina rojavayê Kurdistanê û derxistina şerê navxweyî ye. ***R-5***


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 976 | 3-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/


# 'EMÊ SERKETINA KURDAN LI DÎROKÊ BINEQIŞÎNIN'

Gerîlaya YJA Starê Delal Nûda Avet di roja 7'an ya berxwedanê de li Şkefta Birîndaran bal kişand ser amadekariya gerîla û armanca serketinê. Delal Nûda Avet got, "Emê careke din serketina Kurdan û serketina PKK'ê li dîrokê bineqişînin." ***R-3***



## Yekîtiya Jinên Ciwan ya Şingalê hat avakirin

Kongreya Yekê ya Jinên Ciwan ya Şingalê pêk hat. Kongr bi avakirina Yekîtiya Jinên Ciwan ya Şingalê bi dawî bû. ***R-2***



## `Emê çanda dermanên xwezayî belav bikin û biparêzin`

Rêvebera Navenda Nînhorsax ya dermanên xwezayî Şêrîn Welat got, armanca me ji vekirina vê navendê vegerandina çanda dermanên xwezayî ya windabûyî û parastina wê ye. Herwiha da civak jî li gorî madeyên xwezayî parastina tenduristiya xwe bike. ***R-7***

## Li Kampa Waşokanî Akademiya Şehîd Zevîn Sozdar hat vekirin

Akademiya Civaka Demokratîk ya kantona Hesekê bi navê Akademiya Şehîd Zevîn Sozdar navenda xwe li Kampa Waşokanî vekir. ***R-6***



## Baxçeyê Dayîka Behiya cuda ye… Gulên xwe bi heskirinê xwedî dike

Dayîka gul û kulîlkan got, dema me xaniyê xwe ava kir, min his kir ku ruh jê kêm e, ew ruh xweza, dar û kulîlik bûn. Min baxçeyê xwe yê gulan çêkir. Min heskirin da wan, wan jî wate da jiyana min. R-6





## Xeta Sor ya Rêber Apo

**Farûk Sakik** *R-4*



## Çi di civîna NATO de qewimî?

**Idrîs Henan** *R-5*

# Yekîtiya Jinên Ciwan ya Şingalê hat avakirin

Kongreya Yekê ya Jinên Ciwan ya Şingalê pêk hat. Kongr bi avakirina Yekîtiya Jinên Ciwan ya Şingalê bi dawî bû.

Jinên ciwan ên Şengalê, di salvegera 26'emîn a şehadeta Zîlanê de kongreya xwe ya 1'emîn bi tevlêbûna 150 delegeyên ji Şengalê û mêvanên ji Kampa Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr), bi dirûşma "Di Xeta Zîlan û Bêrîvanan de Rêxistinbûnê Ava Bike, Dagirkerî û Xiyanetê Têk Bibe, Azadiya Şengal Misoger Bike" li dar xist.

Di kongrê de rewşa siyasî û rêxistinî hatin nirxandin. Her wiha peyamên pîrozkirina kongreyê hatin xwendin.
Di kongreyê de bernameya esasê birêxistinbûyînê hat diyarkirin.
Li gorî vê, di birêxistinbûyîna di bin banê YJCŞ'ê de ev biryar derbasdar bûn:

-Birêxistinbûyîna civakî exlaqî û polîtîk, bi rêya fikira azad bi rê ve dibe.

YJCŞ, pergala xwe bi komun, meclîs, akademî, kooperatîk û bi feraseta parastina cewherî ava dike. Li Şengalê bi saziyên xwediyê vê ferasetê re hevkariyê dike. YJŞ'ê wek hêzên parastinê dibîne û xwe ji bipêşdeçûna wê berpirs dibîne.

Her jina ciwan bi fikira xwe ya azad û demokratîk tev li YJCŞ'ê dibe.
Dikeve hewila çareserkirina pirsgirêkên jinan.

Birêxistinbûyîna xwe bi komîteyên perwerde, parastina cewherî, çapemenî, aborî, çand û huner, werziş û tenduristiyê dike.

Di hemû saziyên pergala Rêvebiriya Xweser a Demokratîk a Şengalê hebûna jinên ciwan.

Rêxistina jinên ciwan, bi fam û feraset û birêxistinbûyî de bi tevgera jinan re bi piştevaniyê tev digere.
Temenê jinên wê tev li YJCŞ'ê bibin ji 14 heta bi 30'î ye.



Yekitiya Jinên Ciwan a Şengalê (YJCŞ) di rûniştina dawîn a kongreyê meclisa bi 13 kesan hilbijart. Hat diyarkirin ku meclisa hat hilbijartin, wê bi civîna yekemîn a piştî kongreyê koordînasyona xwe ya bi sê kesan hilbijêre.

Di kongreyê de berxwedana gerîla û Îmraliyê hat silavkirin û kongre bi dirûşmên ''Jin jiyan azadî'', ''Bijî gerîla'', ''Bijî Serok Apo'' û bi govendê qediya.
***ANHA***

# Ev çar sal in JINTV bi îrade û hêza jinan weşanê dike

**Di nava medyaya başûrê Kurdistanê de, JIN TV bûye deng û rengê jinan û hêza jinan derdixe holê û têkoşîna jinan ya bi hezarê salan û reng û rûyê jinan radixe ber çavan.**

Medya û dengên ragihandinê gelek in, hinek ji wan ziyanê digihîjînin meseleya jinan, hinek jî bi kêfxweşî kar ji bo jinan dikin, li hemberî vê yekê hinek wisa difikirin ku xebatê ji bo meseleya jinan dikin lê belê bi aqilê mêrsalarî kar dikin. Bi giştî di medyayê de jin weke amûreke bikaranînê û ji bo bala bîner bikşînin tên dîtin û karên din hemû yên mêran e. Mînak tu carî jinan li ser kamera, montaj, amadekirina nûçeyan kar nekiriye.

Çar sal di ser avakirina kenala JIN TV re derbas bûn, armanca damezrandina Kanala JIN TV karkirin, derxistina hêza jinan û çareserkirina pirsgirêka wan e. Di nava medyayên cîhanî û bi taybatî Başûrê Kurdistanê de hebûn û damezrandina kanala JIN TV pêwîst e. Eve jî wisa kiriye ku JIN TV bi rûyê jinan û bi fikrên azadiya jinan hatiye avakirin ji bo ku careke din hemû rengên jinan bide nava civakê.
JIN TV di 8'ê Adara sala 2018'an di roja cîhanî ya jinan de dest bi weşanê kir, di 30'ê Hezîrana 2018'an de bi awayek fermî dest bi weşanê kir. Bernameyên JIN TV bi zimanê Kurdî, zaravayên Soranî, Kirmancî, Hewremî, Zazakî û hwd. Erebî, Îngilîzî, Tirkî, weşanê dike.

**"JIN TV ji mijaran zêdetir, li çareseriya pirsgirêka jinan digere"**

Rêvebera kanala JIN TV ya Başûrê Kurdistanê Evîn Nesrîn der barê armanca JIN TV û cudahiya wê ji kenalên din de diyar kir ku her medyayek armanca wê heye, bêguman armanca JIN TV jî hemû ew mijarên ku têkiliyên wan bi jinan re heye, serkeftin û pirsgirêkên jinan digre dest û wiha got: "Pirsgirêka jinan di nava kanala JIN TV de tenê weke mijarek û rojevek asayî lê nayê dîtin, dema her pirs û pirsgirêkek cuda hebe, di hemû aliyan de kar dike û li riyên çareseriyê digere. Li Başûrê Kurdistanê gelek medya hene û aqilê desthilatdar û mêrsalarî kar dikin, ji ber wê JIN TV bûye bingehek. Ji ber ku JIN TV tenê kar ji bi pirsgirêka jinan nake, li ser pirsgirêkên civakî û zarok, tendirustî kar dike û hewl dide pirgirêkan çareser bike. Nûçeyên JIN TV weşana bernameyan ji yên televîzyonên dinê cuda ne, JIN TV nîşan dike ku jin çiqas bi hêz in û dikarin kar bikin."



Evîn Nesrîn der barê planên xwe yên sala pêncem de wiha got: "Her sal JIN TV xwe nû dike, ji hemûyan girîngtir ew e ku JIN TV armanca xwe dizane. Em hewl didin bi heman hêz û îradeya xwe karê xwe berdewam bikin, di hemû bername û dosyayan de em kar ji bo armancên xwe dikin û em hewl didin ku heta niha me xwe negihandiye xema kîjan jinan eku em ji pirsgirêkên wê re bibin çareserî."

**"Ragihandin li Başûrê Kurdistanê di bin destê desthilatdariyê de ye"**

Pêşkêşvana JIN TV Lavîn Mehmûd diyar kir ku ragihandin Başûrê Kurdistanê hene nikarin tunditujiya ku li hemberî jinan tê kirin raxin ber çavan û jê re çareserî bibînin, ji ber desthilatdar wan ragihandinan birêve dibin û mêr weke rêveber tê de kar dikin û wiha got: "Di ragihandinên Başûr de ji dosya û wêneyên herî biçûk bigre heta bernameyên herî mezin qet balê nakşînin ser pirsgirêka jinan, di ragihandinên Başûr de derfet ji bo tewanbaran derxistiye ku li hemberî tunditijiya li hemberî jinan bi kar aniye parastina xwe bike, ev ji wisa kiriye ku ragihandin dixwazin pirsgirêka jinan wekî din nîşan bidin û aqilê mêrsalî wisa serdest bûye ku ji ber wê medyayek taybet ji bo jinan weke kanala JIN TV girîngiyek xwe heye."

**"Dezaghên din ên ragihandinê jinan weke amûr bi kar tînin, JINTV bersiveke ji bo wê"**

Endama beşa teknîkê ya JIN TV Sozyar Elî der barê nîşandana jinan di TV'yan de wiha got: "Sedema vê yekê wisa li jinan kirine ku jin nikarin karek din bikin û tenê weke amûrek balkişandina bîneran tên bikaranîn. Ger mijarên medyayê ne rast bin bi riya jinan dixwazin bala bîneran bikşînin. Her wiha bawer nakin ku jin wê bikarin karê teknîkê bikin û kamera û kompîtorê bi kar bînin lê belê ezmûna JIN TV îsbat kiriye ku jin dikarin ji derveyî karên pêşkêşvaniyê, karên din di nava ragihadinê de bikin û bûye bersivek ji bo hemû kesên ku dibêjin jin nikarin hemû karan bikin. Her wiha JIN TV çar sal in kar dike û wê nêrînê şikandiye."
***JINHA***



# `Emê çanda dermanên xwezayî belav bikin û biparêzin`

Rêvebera Navenda Nînhorsax ya dermanên xwezayî Şêrîn Welat got, armanca me ji vekirina vê navendê vegerandina çanda dermanên xwezayî ya windabûyî û parastina wê ye. Herwiha da civak jî li gorî madeyên xwezayî parastina tenduristiya xwe bike.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Dermankirina xwezayî pir girîng e û mirov sûdeke baş jê digire. Çimkî bi giyayên xwezayî her nexweşî tê dermankirin. Di dema berê de dermankirina xwezayî pir pêşketî bû, herwiha mirovan ji bilî wê ti dermanên din bi kar nedianîn. Lê niha ev çand winda û lawaz bûye. Tevî wê jî hin jin heta niha dermanên xwezayî bi destê xwe çêdikin û ji bi kar tînin.

Li Qamişlo bi destê komeke jinan 28`ê Hizêrana derbasbûyî Navenda Nînhorsax ya Dermankirina Xwezayî û Piştgiriya Derûnî hat vekirin. Li navendê 7 kes kar dikin. Herwiha gelek beşên dermankirinê hene; dermankirina bi giyayan, ya fîzîkî bi zeyt û giya, werzişa yoga, dermankirina piskolojîk û dermankirina bi bernameyên xwarinê yên ji bo qelewbûn û lawazbûnê bi awayên xwezayî.



Derbarê vekirina navendê û armanca wê de, herwiha girîngiya dermankirina xwezayî de, rêvebera navenda Nînhorsax Şêrîn Welat ji me re axivî û nêrîna xwe anî ziman. Rêvebera Navenda Nînhorsax Şêrîn Welat da zanîn ku du sal in haziriya navenda dermankirina xwezayî dikin û axaftina xwe wiha domand: "Karê me li vir tev bi dermanên xwezayî ye. Vekirina navendê dereng ket, çimkî derfetên me kêm bûn, herwiha alav û pisporên ku li vir kar bikin ne amade bûn. Navend ji 9`ê sibehê heta 2`yê nîvro wê vekirî be. Piştî nîvro jî eger rewşek hebe emê çareser bikin. Jixwe dermankirin jî bi bihayekî pir kêm e. Herwiha got, berî ku em navendê vekin me hin lêkolînên li ser dermanên xwezayî kirin, herwiha me xwe gihand hin kesên pispor yên ku vî karî baş nas dikin, da ku em bi hev re kar bikin û xizmeta civaka xwe bikin."

**`Armanc belavkirina çanda dermanên xwezayî ye`**

Şêrîn got, aramanca me ji vê navendê ew e ku em çanda dermanên xwezayî vegerînin û di nava gel de belav bikin. Çimkî ev çand winda bûbû. Hin kes hene heta niha van dermanan bi kar tînin, lê ew jî xwe nadin xuyakirin. Ji bo wê jî me xwest em vê xebatê bi rêxistin bikin û di aliyê zanistî de gavekê biavêjin.

**`Emê hewl bidin xebata xwe berfireh bikin`**



Şêrîn diyar kir ku ji bilî dermankirinê wê perwedeyên derbarê dermanên xwezayî de bidin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Emê her carê çend kesan perwerde bikin da ku em vê xebatê berfireh bikin. Herwiha emê hewl bidin ku navenda Nînhorsax li bajarên din jî vekin."

Şêrîn Welat da zanîn ku alava çêkirina zeytê li navenda wan heye û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Emê tevayiya cûreyên zeytê li navendê çêkin, em zeytê ji ti cihan naynin, emê bi xwe amade bikin. Herwiha giyayê ku ji me re pêwîst be emê biçînin û ji bo dermanan bi kar bînin."

Rêvebera Navenda Nînhorsax Şêrîn Welat di dawiya axaftina xwe de got, em bi hêvî ne jinên ku ji vê karî fêm dikin û dixwazin vî karî bikin xwe azad bikin û werin navenda me da ku em bi hev re vî karî pêş bixin.

# Cara yekê ezmûna xwendina serbest pêk hat

**Têkildarî nirxandina ezmûnên pergala serbest û giştî, herwiha rêjeya serketina xwendekaran, endamê Navenda Ezmûnan ya Herêma Cizîrê Ebdulezîz Berzencî peyivî.**

Di sala xwendinê ya 2021-2022`ê de Desteya Perwerde û Hînkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê cara yekemîn pergala xwendina serbest ji bo xwendekarên refên 9 û 12`an ragihand û îsal di 19`ê Hezîranê de ezmûn bi dawî bûn. Ji bo xwendekarên refên 9 û 12`an ku bi rêk û pêk li dibistanan perwerde dibûn, li şûna lidarxistina ezmûnên wekhev, sîstema nirxandinê hat danîn.

Têkildarî nirxandina ezmûnên pergala serbest û giştî, her wiha rêjeya serketina xwendekaran, endamê Navenda Ezmûnan a Herêma Cizîrê Ebdulezîz Berzencî peyivî.
Berzencî got, tevî tecrûbeya yekemîn bû jî wan ezmûnên pergala serbest bi awayekî serketî kirine û got, "Ji bo xwendekarên ku di dibistanan de jî pergala nirxandinê bêhtir dikare rewşa wan a rast binirxîne, di nava wê nirxandinê de jî ezmûn hene."

**'Divê di 3 branşan de bi ser kevin'**

Ebdulezîz Berzencî da zanîn ku pileya xwendekarên pergala serbest ên refa 9`an ji 800`î gava xwendekar 320`an bi dest bixin, bi ser dikevin, refa 12`an jî ji 700`î de ku xwendekarên 280`î bi dest bixin, bi ser dikevin. Wî got, "Di heman demê de xwendekarên ku di 3 branşan de bi ser nekevin, bi bin dikevin. Yên ku di 2 branşan de bi ser nekevin, bi şert heke di wan her du branşan de ji pileyê çaryekekê bibin, bi ser dikevin."

Li gorî Navenda Ezmûnan a Herêma Cizîrê hejmara xwendekarên ku ezmûnên pergala serbest pêşkêş kirin, 359 bû, ji wan 330 yên refa 12`an bûn, 29 jî refa 9`an bûn. Xwendekarên giştî jî refa 9`an 4 hezar û 649 û refa 12`an jî 2 hezar û 53 bûn.

Li ser rêjeya serketinê ya her du pergalan Berzencî got, "Ji bo xwendekarên nirxandinê rêje ji sedî gihaştiye zêdeyî 85`an, yên pergala serbest jî gihaştiye 45`an."



Berzencî got: "Di ezmûnên pergala serbest de 3 rewşên xapandinê derketin, ew kes jî ji sala xwe dûr ketin û ew ê nikaribin bikevin ezmûneke din jî. Dimîne heta sala bê."
Li ser dema ragihandina encamên ezmûnên pergala serbest û ya giştî Ebdulezîz Berzencî got: "Encam amade ne, ew ê di demeke nêz de bên eşkerekirin."

Desteya Perwerde û Hînkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di 13`ê Hezîranê de bi biryarnameyekê ezmûneke din (tekmîlî) ji bo xwendekarên refa 12`an a xwendina serbest ragihand. Ezmûnên wê jî dê di navbera 17-25`ê Tîrmehê de bin.
***ANHA***

# Li Kampa Waşokanî Akademiya Şehîd Zevîn Sozdar hat vekirin

Akademiya Civaka Demokratîk ya kantona Hesekê bi navê Akademiya Şehîd Zevîn Sozdar navenda xwe li Kampa Waşokanî vekir.

Akademiya Civaka Demokratîk a Kantona Hesekê, bi merasîmekê navenda xwe li kampa Waşûkanî ya koçberên Serêkaniyê ya li taxa Telayî ya bajarê Hesekê vekir. Navenda akademiyê bi navê Şehîd Zevîn Sozdar hate vekirin. Malbata Zevîn Sozdar a 2014`an di encama bersivdayîna êrişên çeteyên DAIŞ`ê û Cebhet El-Nusra li ser herêma Serêkaniyê şehîd bû, her wiha bi dehan koçberên li kampê û endamn saziyên sivîl, komîteyên perwerdeyê beşdarî merasîmê bûn.

Di merasîmê de ji rêveberên Akademiya Şehîd Rûken a kantona Hesekê Ebdulxenî Oso bal kişand ser girîngiya perwerdeyê, pêşxitina civakê di warê zanist, çandî û civakî de û destnîşan kir ku armanc ji akademiyan belavkirina zanebûn, fikir û çandê di nava civakan de ye.

Her wiha diyar kir ku Akademiya Şehîd Zevîn Sozdar dê roleke sereke di dayîna fikir û felsefeyê ji koçberên kampê re pêk bîne da ku xwe li gorî jiyana civakî pêş bixin.

Ebdulxenî Oso di dawiya axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Di vê pêvajoyê de dijmin hemû nirxên civakê ji ziman û çandê dike hedef. Ji ber wê jî divê em parastina çanda xwe ya civakê bikin ku em xwe bispêrin çanda neteweya demokratîk. Em bang li beşdaran dikin ku tev li perwerdeyan bibin da ku xwe pêş bixin û civakeke azad û demokratîk ava bikin."

Di dawiyê de deriyê akademiyê ji aliyê dayika şehîd Zevîn Sozdar, Zerga Hesen û bavê wê Cemîl Mihemed Wehîd Xelîl ve hate vekirin.





Dewreya yekemîn a perwerdeyê wê îro bi navê Cabir El-Elî dê îro dest pê bike. Cabir El-Elî 21'ê Tebaxa 2021'an de şehîd bû.

Di dewreya perwerdeyê de dê waneyên fikrî der barê girîngiya perwerdeyê, welat û welatparêzî, şerê taybet û hwd werin dayîn.

***ANHA***

# Baxçeyê Dayîka Behiya cuda ye…Gulên xwe bi heskirinê xwedî dike

**Xalid Etê/Qamişlo**

**Dayîka gul û kulîlkan got, dema me xaniyê xwe ava kir, min his kir ku ruh jê kêm e, ew ruh xweza, dar û kulîlik bûn. Min baxçeyê xwe yê gulan çêkir. Min heskirin da wan, wan jî wate da jiyana min.**

Dayîka Behiya ya bizendûbend û kesayeta jina tijî hêz, hêvî û heskirin, herwisa bi zarşîrînî û gotinên xwe yên xweş, weke xwedawendeke ji rûpela dîroka jinê ya hatî dizin hatibe, xuya dike. Bi wan mîmikên têra xwe westiyayîn, bi wan destên têra xwe di nava xakê de xebitîn, li ber wê germa havînê, li ber siya dara berî 30 salî bixwe çandî, di nava bêhna rihan, çîmen û kulîlkan, girêdan û çîroka heskirina xwe ya xwezayê ji me re vedibêje.

### Dayîk û xweza, dar û kulîlk…hevaltî

Behiya Sebrî (47) ji taxa Enteriyê ya rojhilatê bajarê Qamişlo ye. Mijûlbûna xwe ya bi xweza, şînkayî û kulîlkan ya nêzî 30 salî bi hevaltiyê bi nav kir û wiha axivî: "Xwedîkirina gul û kulîlkan ne bi avê tenê ye, berî her tiştî pêwîstiya wan bi heskirinê heye. Di nava van salan de min ev fêm ki. Jixwe hevaltiya min bi vê xwezayê re ji piçûkaniyê ve ye. Wê çaxê min giyayê Sebrê (Sebar) xwedî dikir. Heskirineke min ya bêhempa jê re çêbûbû. Lê bavê min her tim gazinc dikirin. Digot, ev çi derzî ne, te anîne mala me. Weke derziyan didtîtin, lê nêrîna min cuda bû. Bi rastî wê şînkayiyê dilê min xweş dikir û enrjiyeyeke erênî dida min."

### Xanî bêruh bû..xwezayê ruh dayê

Piştî hevaltiya yekê ya Dayîka



Behiya bi giyayê sebrê re heskirina wê ya bi xweza û gul û kulîlkan re mezintir dibe. Pişt re guleke din ya bi navê sicade jî xwedî dike. Salên 90î dema ku dizewice û li gel hevjînê xwe xaniyê xwe ava dikin, dibêje kêmayiyeke vê malê heye ruh jê kêm e. Divê ji bo dar û kulîlkan ciyeke taybet hebe. Ji ber wê li gorî xwe û bi destê xwe hewşa malê bi dar û kulîlkan dixemilîne û nafûreyeke avê jî çêdike.

### Bexçeyê bi 50 cureyên gulan û her çar demsalan..

Dayîka Behiya wan kêliyan tîne bîra xwe û bi van agahiyan wan rojan wiha tîne ziman: "Kesên derdora min digotin, ev çi ye tu dayîk î. Henekê xwe bi min dikirin, digotin, li şûna tu bi van gulan ve mijûl bibî, here karekî din bike. Lê min gotinên wan bêwate didîtin û min dest bi komkirina tov û cureyên kulîlkan kir. Min tov li hewşê, nêzîkî bîra avê û textan diçandin. Min bi rengekî bedew û li gorî taybetmendiyên wan li hewşê bi cî kirin. Niha li hewşa min nêzî 50 cureyên gulan yên her çar demsalan hene. Li cem min nêrgiz bi çar rengan, çîmen û sosin bi du renga, rihan, enber, qurnefîl, guhbizin û bi dehan cureyên sebara jî li cem hene. Wê jimara wan pirtir bûya, lê astengiya li pêşiya min derdikeve, ew e ku hin kulîlk pêwîstiya wan bi dermanan heye û bihayê wan jî giran e. Ez gulan nakirim, ez wan kom dikim. Ez tov tînim diçînim û pişt re wan bi gulên din diguherînim. Yan jî kesên ku ji çandina wan ne serwext in, ez tov ji wan digirim û bixwe wan xwedî dikim û parekê didim wan.

### Li Baxçeyê Şehîdan, kulîlkên Dayîka Behiya

Dayîka Behiya bi heskirin û rûgeşî behsa gulên xwe dike, lê ya balkêş ew e ku li navê wan qertafa `min` zêde dike û axaftina xwe wiha didiomîne: "Jixwe min navên keçên xwe Şîlan, Zîlan û Ebîr li gulan kirine. Ez gulan jî ji bo xwe tenê xwedî nakim, ez wan li dost û heskiriyan jî belav dikim. Gulên min li Rojava belav bûne û heta Hesekê û Kobanê çûne. Lê ya ku ez erk dibînim, çandina gul û kulîlkan li goristana Şehîdan ya Delîl Saroxan e. Di çi rewşê de bim heta li ser piyan bim wê kulîlk li ser milê min bin û ezê ji çûna goristanê û çandina gulan qut nebim. Kesên ku berê henekê xwe bi min dikirin niha tê bedewiya wan dibînin û ji min dixwazin.

### Huner û wêje bê gul û kulîlkan kêm e

Dayîka Behiya herwisa dibêje bê gul û kulîlkan wê kêmayiyeke mezin di vê jiyanê de hebe û wiha got: "Hozan, stiranbêj û helbestvan ji bo ku bedewiya yara xwe û heskirina xwe vebêjin, divê bedewiya wan bişibînin xweza û kulîlkan. Ji ber wê heta di



stiranan de jî kulîlk û navên wan bala min dikişînin û di nava gotinên stiran û helbestan de jî ez li gulan digerim."

### Gul û xweza, giyanê mirov bedew dikin

Dayîka Behiya herwisa bal kişand ser estetîk û bedewiya kulîlkan ya li nava hewşê û axaftina xwe wiha qedand: "Ez xwedîkirina wan di hundirê xaniyan de na pejirînim, ez vê rewşê ji wan re weke zindanê dibînim. Divê xweza neyê qeydkirin. Ji ber wê kulîlkên min tev li bin ezman in. Jixwe li ser guncawbûna rengê guldanik û gulan jî huner pêwîst e. Ku her du reng bi hev re guncaw bin, bedewiya wan pirtir dibe. Bi rastî jî eger mirov ji xweza û kulîlkan hes bike wê ew jî heskirinê ji bo me bibexşînin û jiyaneke biwate bidin me. Ji ber wê jî ez van gulan, weke diyariyan bi heskiriyên xwe dibexşînim. Lê kesê heskirinê di hundirê wî de nebînim, ne pêkan e bidême. Lewra bi qasî xwedîkirin û guhdarîkirinê, pêwîstiya gulan bi heskirinê heye.



# 'Emê serketina Kurdan li dîrokê bineqişînin'

Gerîlaya YJA Starê Delal Nûda Avet di roja 7'an ya berxwedanê de li Şkefta Birîndaran bal kişand ser amadekariya gerîla û armanca serketinê. Delal Nûda Avet got, "Emê careke din serketina Kurdan û serketina PKK'ê li dîrokê bineqişînin."

Gerîlaya YJA Starê Delal Nûda Avet li Şikefta Birîndara di roja 7'an a berxwedanê de di bin êrîşên giran ên hewayî de qala rêveçûna şer, rêbaza êrişê ya dijmin û sekna gerîla kir:

### Her kes li benda vê kêliyê bû

"Niha li Şikefta Birîndara em di çeperê de ne. Weke ku hûn jî zanin bi bombardûmana giran a hewayî ya 14'ê Nîsanê de ji bejahî û hewayî ve di 17'ê Nîsanê de êrîşan destpê kirin. Li Çiyayê Reş, Kurojahro, Şehîd Şahîn û Şikefta Birîndara êrîşên gelekî berfireh destpê kirin. Destpêka wê ji bo me surprîz nebû, ji ber ku em li benda rojeke wiha bûn, me xwe li gorî wê amade dikir. Di êvara êrîşê de her kes bi moral, motîvasyon û hêzeke mezin bûn. Wê şevê ev rewş bi rengekî şênber dihate fêhmkirin. Lewma her kes li benda vê kêliyê bû. Hesabê wê dihate kirin ku êdî wê çi bê kirin. Her kes bi coş ketibû çeperê. Rewş niha jî bi heman rengî ye.

### Em nahêlin ku hêzên xwe daynin

Ji 17'ê mehê û vir ve em nahêlin ku dijmin hêza xwe li qadê dayne. Êrîşên ji bejahî ve gelî dibin. Ji ber ku em nêzî xetên dijmin in, nêzî xeta Xeregolê ne, ji bejahî ve êrîşên giran têne kirin. Nİha li Şehîd Cûdî, Tepê Ortê berxwedaneke mezin heye, heval li ber xwe didin. Bi hevalan re moraleke gelekî mezin heye. Bi wê berxwedanê, bi wî ruhî em li vê derê li ser piyan e. Em hewl didin ku bi hev re hin tiştan bikin. Li vir yekane tişta şênber rastiya serketinê ye. Ji doh serê sibehê ve Kobrayan bê rawestan êriş kirin, lê belê tevî vê yekê jî moraleke mezin bi me re heye. Em dibêjin, 'tu çi dike bike tu yê nikaribe bandorê li me bike. Tu yê bibîne ku em ê ji berxwedana xwe tawîzê nedin'. Ev rastî ye, doh bi şev jî hîn bêhtir şênber bû.

### Ji berxwedanê jî wêdetir em ber bi serketinê ve dimeşin

Îro 23'ê Nîsanê ye, salvegera êrîşa par a dagirkeriyê ya li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê ye. Em wê serketinê careke din ji bo xwe weke xetekê dibînin û berxwedêrên Werxelê, Zendûra, Delalan, Viyanan, Baweran ji vê derê bi minet û rêzdariyeke mezin bi bîr tînin. Em soza xwe dubare dikin ku li ser xeta wan, bi ruhê wan ê berxwedanê, bi karaktera wan a serketinê berpirsyariyên xwe pêk bînin. Çi dibe bila bibe, ji berxwedanê jî wêdetir em ber bi serketinê ve dimeşin. Tenê sedemeke êrîşa ewqasî giran a bejahî û hewayî ya dijmin heye; ew bi xwe jî zane ku êdî xeta dawî ye. Em ê heta dawiyê vê xetê dewam bikin û bi ser bikevin. Tirsa dijmin ji vê ye. Em her şev vê yekê bi şênberî nîşan didin, her sibehê bi şênberî nîşan didin.

### Di navbera me û wan de 300-400 metre hene

Çepera ku em niha tê de ne çepereke li jora çepera dijmin e. Derdora 300-400 metre di navbera me de hene. Qet xwe nalivînin, ji bo xwe bilivînin em li bendê ne, em gelekî dixwazin lê belê qet xwe nalivînin. Tenê carna serê xwe radikin û dadixînin. Niha dijmin li ku ye, çi dike, hewl dide çi bike, wê çawa bibe, ji kîjan alî ve bê, em ê çi bikin, divê em çi bikin; em niha li ser van kûr dibin.

### Em mîrateya werxelê ji xwe re dikin esas

Em hewl didin perspektîfên hevalê Cûmalî ji xwe re bikin esas. Hevalê Cûmalî û hemû hevrêyên pê re li ber xwe dan li Werxelê bi rastî jî mîrateyeke mezin ji me re hiştin. Ev gelekî bi wate û girîng bû. Niha em li vê derê bi rêya vê perspektîfê di tunelên şer û qadê de tevdigerin. Li gel vê yekê em hewl didin tiştên nû jî biafirînin. Hewl didin ji nû ve dîzayn bikin lê belê bi giştî em amade ne, em bi moral in û hevgirtî ne. Ev gelekî girîng û hêja ye. Ya ku tehdeyê li me dike ew e ku em nikarin bi hevalan re rûnê û hinekî sohbet bikin. Ew ken, daxwaz û xwesteka lêdanê ji me re dibe moraleke mezin. Em bi yek kulmî lê didin û ev yek nîşaneya me ya serketinê ye.

### Hebûna li vê derê cihê serbilindiyê ye

Hebûna li vê derê ji bo min bi rastî jî gelekî bi wate ye, di heman demê de cihê serbilindiyê ye. Mayina bi afirînerên vê jiyanê re ji bo min girîng e. Girîng e ku li vê derê li nava vê derya serketinê me. Em hewl didin ku li ser xeta Apoyî xwe ji nû ve lêpirsÎn bikin û bibin hêza afirandinê. Em hewl didin bibin hêza lêdanê ya kesayetiya milîtan a Apoyî. Weke jinekê cihgirtina li vê çeperê hîn bi wate ye, hîn girîng e û nîşaneya pêşengiyê ey. Bêguman kêmasiyên me jî dibin, carna em dikevin nava kêmasiyan. Bi vê wesîleyê dixwazim vê yekê bêjim; li vê derê çi dibe bila bibe, çi biqewime jî eger rêxistin rojekê dengê min bibihîze, ji ber kêmasiyên rû dane hemûyan rexnedayina xwe didim. Bi dîtina min me dikarîbû ya herî baş bikira û em ê bikin.



### Bêyî fikar û gumanan em li ser piyan e

Bêguman em timî li ber xwe didin û em ê li ber xwe bidin. Li vê derê em ê serketinê misoger bikin. Yilmaz Guney gotibû 'Ya em ê bi ser bikevin, ya em ê bi ser bikevin. Li şûna jiyaneke bi koledarî, ez mirineke bi şoreşgerî tercîh dikim'. Di berxwedana Kobanê de dayikekê digot, 'Li şûna ku li ser çoka xwe bimirim, ez ê berxwedana li ser piyan tercîh bikim' û bi wî rengî bû. Em koletiyê qebûl nakin. Li vê derê em ji bo wê dayikê li ber xwe didin, em ji bo mîrateya Yilmaz Guney li ber xwe didin. Ji bo rastiya wî gelî li ber xwe didin û em neçar in ku vê berxwedanê bi ser bixînin. Lewma mîna ku wê dayikê got, heta dawiyê em li ser piyan e, bêyî fikar û gumanan. Em ê serketineke din a Kurdan, serketina PKK'ê li dîrokê bineqişînin. Ji vê bawer dikin û ji vê derê ji hemû hevrêyên li ber xwe didin serketinê dixwazim. Em bi can û bi ruh bi hev re ne. Em ê heta dawiyê xwedî li mîrateya hevrêyên xwe yên şehîd derkevin û di şexsê wan de bi navê hevrêyan hemûyan soza xwe dubare dikim."

***ANF***

# Birîndarên şer: Emê canê xwe fedayî xaka xwe bikin

**Endamên Saziya Birîndarên Şer ya Minbicê diyar kirin ku amade ne canê xwe fedayî xaka xwe bikin û wê ji êrişên dagîrkeriya Tirk biparêzin.**

Dewleta tirkî ya dagîrker di vê dawiyê de gef û êrişên xwe li ser bakur û rojhilatê Sûriyê




zêde kirine, lê şêniyên herêmê diyar kirin ku wê li hemberî van êrişan bisekinin.

Girêdayî vê mijarê, endamê Saziya Birînadrên Şer a Minbicê, Mehmûd El-Xelef wiha anî ziman: "Bi navê hemû birîndarên ku di oxira parastina vê xakê de beşek ji laşê xwe dane de, em her êriş û gefên li ser herêmê, li ser xaka Sûriyê bi giştî red dikin. Armanca dewleta Tirk a dagirker ji van gefan têkbirina projeya neteweya demokratîk e."

El-Xelef li dijî dagirkeriya Tirk banga hevgirtinê kir û wiha berdewam kir: "Me beşine ji laşê xwe fedayî xaka xwe kir û amade ne ji bo parastina vê xakê giyanê xwe feda bikin. Em bang li şêniyên xwe dikin ku li dijî dagirkeriya Tirk bibin yek." Raman Minbic ê ji Saziya Birîndarên Şer wiha anî ziman: "Em êriş û gefên dagirkeriya Tirk ên li ser herêmên ku me yên ku ji terorê hatine rizgarkirine, şermezar dikin."

Raman Minbic di berdewamiya axaftina xwe de anî ziman ku



ku dagirkeriya Tirk bi hinceta avakirina ''herêma ewle'' dixwaze deverên din ên xaka Sûriyê dagir bike û got: "Me ji bo parastina van deveran şehîd û birîndar dan. Sonda me ew e ku em ê heta dilopa dawî ya xwîna xwe xeta parastinê xaka



xwe ji her êrişan dewam bikin." Di dawiya axaftina xwe de Raman Minbic bang li şêniyan kr ku li hemberî dagirkerên ku dixwazin aramiya herêmê têk bibin, bi hêzên xwe re bisekinin.

***ANHA***

# ’Yekîtiya gelên herêmê bingehê serkeftinê ye’

Endamên Saziya Malbatên Şehîdan ya bajarê Hesekê êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser herêmê şermezar kirin û gotin, wê birêxistinbûn û yekîtiya gelên herêmê, têkçûna dagîrkeran misoger bike.

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

Êrişên dewleta tirkî yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dewam dikin. Endamên Saziya Malbatên Şehîdan ya bajarê Hesekê gef û êrişên dewleta tirkî şermezar kirin û dan zanîn ku yekîtiya gelên herêmê wê tevayiya êriş û planên ser herêmê têk bibe.



### ’Armanca dagîrkeriyê tinekirina destkeftiyan e’

Endama Desteya Jinê ya Saziya Malbatên şehîdan ya bajarê Hesekê Fatma Hisên êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser herêmê şermezar kirin, herwiha diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker, destkeftiyên gelên bakur û rojhilatê Sûriyê li ser desthilatdariya xwe xeter dibîne û axaftina xwe wiha domand: “Bi destpêkirina aloziya Sûriyê re, gelên herêmê sîstemeke demokratîk ava kirin. Li gorî Projeya Neteweya Demokratîk xwe bi rêxistin kirin û bi awayekî serkeftî herêm bi rê ve birin. Projeya Neteweya Demokratîk bû bingehê rêxistinbûn û azadiya gelên herêmê. Dema dagîrkeriya tirkî dît ku ev projeya demokratîk pêş dikeve û wê çareseriyê bi xwe re bîne seranserî herêmê, li ser xwe xeter dît û bi her awayî êriş dike. Dagîrkerî dixwaze ji aloziya Sûriyê sûdê bigire û amancên xwe yên dagîrkiriyê pêk bîne. Diyardeya azadiyê li kû hebe, dewleta tirkî ya faşîst êrişî wir dike.”

Fatma Hisên bal kişand ser krîzên hundirê Tirkiyê û wiha axivî: “Dagîrkeriya tirkî di krîza aborî, siyasî, doplomasî û civakî re derbas dibe. Hikûmeta AKPê dixwaze krîzên di hundir de derbasî welatên derdorê bike. Ji ber wê bênavber êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê dike.”

### ’Yekîtiya gelên herêmê wê serkeftinê misoger bike’

Endama Desteya Jinê ya Saziya Malbatên şehîdan ya bajarê Hesekê Fatma Hisên da zanîn ku Projeya Neteweya Demokratîk kilîta tevaiya pirsgirêkên herêmê û Rojhilata Navî ye û axaftina xwe wiha qedand: “Proje û fikrê Neteweya Demokratîk, ji gelên Rojhilata Navî re xelasiya ji dagîrkerî û serdestiyê ye. Ji ber wê divê gelên herêmê li gorî wê xwe pêş bixin û nirxên hatîn bidestxistin biparêzin. Hêza dijimin çiqas mezin be jî, wê li hemberî berxwedana gelan têk biçe”

Endamê Saziya Malbatên Şehîdan Mihemed Dawê jî da zanîn ku



dewletên wekî Rûsya û Amerîka, ji bo berjewendiyên xwe beşdarî krîza Sûriyê bûn û axaftina xwe wiha domand: “Dagîrkeriya tirkî li ber çavê tevayiya cîhanê komkojiyan dike. Rûsya û Amerîka qaşo li herêmê garantor in, lê xwe bêdeng dikin. Dîroka her du dewletan ji her kesî re diyar e. Ji bo berjewendiyên xwe, çi ji destên wan tê dikin. Ev her du hêz dijminên gelan in. Niha jî dixwazin gelên herêmê ji bo berjewendiyên xwe bikin qurban. Lê wê negihin armanca xwe. Lewra bê Rêveberiya Xweser çareseriya kirîza Sûriyê ne pêkan e.”

### ’Armanca dagîrkeriyê çewisandina vîna azad e’

Dawê da xuyakirin ku armanca dagîrkeriya tirkî ji êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê, têkbirina Projeya Biratiya Gelan e û axaftina xwe wiha domand: “Ev 12 sal in ku dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dikin. Ew sûcên dijmirovî dikin, jin û zarokan dikin amanc. Di dema dawî de, êrişên dagîrkeriyê yên bi balafirên bêmirov zêde bûne û rasterast welatiyan dike amanc. Dewleta tirkî ya dagîrker dixwaze bi van êrişan, îradeya gelan bişkîne. Dagîrkerî bi êrişên xwe yên ser welatiyan, polîtîkaya xwe ya qirkirinê didomîne. Dewleta tirkî ji bo tevayiya gelên herêmê û Rojhilata Navî xetere. Dewleta tirkî ya qirker wê di hundirê xwe de têk biçe. Siyasetên wê yên dagîrkeriyê li tevayiya qadan têk çûn e, ji ber wê bi awayekî hovane êrişî Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê dike.”

### ’Ti hêzên Navneteweyî wê gel neparêzin’

Dawê bal kişand ser berxwedana gelên herêmê ya li hemberî êrişên dagîrkeriyê û wiha axivî: “Dagîrkeriya tirkî bi van êrişan, dixwaze îrade û baweriya gelan têk bibe. Lê nizane ku gelên herêmê tevayiya lîstik û xefkên dagîrkeran nas kirine. Gelên ku baweriya xwe bi fikir û felsefeya azad anîn, ti caran gavan paş ve navêjin û ji bilî azadiyê ti tiştî qebûl nakin. “ Endamê Saziya Malbatên şehîda Mihemed dawê ji gelên herêmê xwest ku li hemberî kiriyarên dagîrkeriya tirkî bêdeng nemînin û axaftina xwe wiha qedand: “ Pêwîst e em hêza civakê bikin bingeh û li ber xwe bidin. Lewra ti hêzên navneteweyî wê gel neparêzin. Çawa bakur û rojhilatê Sûriyê bû sembola berxwedanê, wê berxwedan dewam bike û êriş têk biçin.”

# Meclisa Leşkerî ya Minbicê soza parastina herêmê da

**Fermandariya Giştî ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê bi daxuyaniyekê êrişa dewleta tirkî ya dagîrker ya ser gundê Ereb Hesen ku di encama wê de du zarok şehîd bûn, şermezar kir. Herwiha soza parastina aramî û ewleyiya bajarê Minbicê ji êrişan da.**

Pêncşema borî dewleta tirkî ya dagîrker gundê Ereb Hesen yê li bakurê bajarê Minbicê topbaran kir û di encama wê de du zarok şehîd bûn.

Têkildarî mijarê Fermandariya Giştî ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Artêşa tirkî ya dagîrker sûcên xwe li dijî sivîlan didomîne, gundewarên ku sivîl di wan de dijîn dike hedef. Armanca wê ji vê yekê ew e ku tirsê di nava şêniyan de belav bike. Ji ber wê jî bê serûber û rojane gundewarên bakurê Minbicê yên li ser xeta Sacûr topbaran dike.

Di encama topbarana duh ber êvarî ya dewleta Tirk a




dagirker û çeteyên wê li ser gundê Ereb Hesen de du zarokên bi navê Mihemed Ebduletîf El-Henefî (13) û Ehmed Fûad El-Henefî (12) şehîd bûn.

Em di Meclisa Leşkerî ya Minbicê de parastina sivîlên Minbicê ji hemû xeterî, binpêkirinên û hewldanên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ku ber bi bajar ve biçin, girtiye ser milê. Em sersaxiyê ji malbata her du zarokan re dixwazin.

Em soz didin ku em ê parastina Minbicê û gundewarên wê bikin. Em ê şopdarê rêya şehîdan bin. Parastina xak û gel bikin û li hember her kesê ku dixwaze destkeftiyên gel û şoreşa me têk bibe, bisekinin.”

***ANHA***



## Xeta Sor ya Rêber Apo

**Farûk Sakik**

Di van rojên dawî de şantaj, tehdîd û gefên ji bo herêma rojavayê Kurdistanê ji nû ve dest pê kirin. Erdogan dema ku dikeve tengasiyê, berê xwe dide Rojava. Yan gefan dixwe yan jî weke Efrîn û Serê Kaniyê dagîr dike. Ev hewldanên wî ji bo zeximkirina desthilatdariya wî ye. Dibe xeyalên wî yên Neo-Osmanî jî hebin. Emê van daynin aliyekî û vegerin gefên îro ku Erdogan xistine rojeva xwe.

Berî ku derbasî îro bibim, ji sala 2015’an hevdîtinekê bîr bixim. Ev diyalog û hevdîtin, di navbera Rêber Apo, Sirri Sureyya Onder û Erdogan de derbas dibe. Di pêvajoya şerê Kobanê yê ku şerê man û nemanê bû, derbas dibe. Di kêliyên ku DAIŞ wê êdî bi ser nekevê de, Erdogan ji Sirri Sureyya Onder re dibêje; “Ji Ocalan re bibêje Rojava xeta meya sor e, emê destûrê nedin ku li wê derê ji bo Kurdan statûyek ava bibe.” Dema ku vê peyamê digihînê, Rêber Apo bersiveke wiha dide; “Ji Erdogan re bibêje ji bo min jî li Kurdistanê herêma Rojava xeta sor e. Çi dibe bila bibe emê statûyekê ava bikin.” (Me, ev diyalog ji Sirri Sureyya Onder bihîst)

Çima herêma rojavayê Kurdistanê ji bo Rêber Apo xeta sor bû? Li vê derê şoreşek pêk hatibû. Sîstema rêveberiya xweser hatibû îlankirin. Paradîgmaya Ocalan ya Konfederalîzma Demokratîk ku ji bo Rojhilata Navî bi salan bû kedeke mezin dabû li vê heremê aj û bejin dabû. Li vê heremê di pratîkê de hatibû isbatkirin. Li vê heremê her kesî bi vê paradîgmayê bawerî anîbû. Heger herêma rojavayê Kurdistanê ji bo Rêber Apo xeta sor be, Erdogan wê ji vê derê êrişî Ocalan bikira. Dixwest li ser herêma rojavayê Kurdistanê re Rêber Apo iqna bike. Li gorî texmîn, nirxandin û tecrûbeyên me ji notên hevdîtina xwendî, Rêber Apo bi ti awayî li gorî berjewendiyên AKP’ê tev nagere.

Li Tirkiyê pêvajoya hilbijartinê dest pê kir. Heger pêşwext be di meha Mijdarê de ye. Heger hilbijartin di dema xwe ya asayî de be jî di Hezîrana 2023’an de wê were çêkirin. Hemû îstastîk û anket dibêjin AKP berçem berçem diçe. Di hejmara dengê wî de ketineke mezin heye. Bi serê xwe û bi MHP’ê re ne mimkun e ku bibe desthilatdar. Ji bo wê jî tek rêyek li pêş wan heye û ew jî dengên HDP’ê-dengê Kurdan e. Li gorî encamên hilbijartinên dawî ji sedî 12 dengê HDP’ê hene. Ev jî teqabulî nêzikî 10 milyon dengan dike. Erdogan ji niha ve li dû van dengan ketiye. Ji bo vê yekê jî xwe avêtiye ber deriyê-bextê Rêber Apo.

Em texmîn dikin, îro li Îmrali ji bo Rêber Apo were iqnakirin deste li du desteyan diçin û tên. Demek Ocalan iqna nabe ev car jî li ser Rojava re gef tên xwarin. Erdogan derdikeve pêşberî kamereyan û xeta Rêber Apo ya sor tehdîd dike. Dibêje ku amadekiryên me temam bibin emê bikevin herêma rojavayê Kurdistanê.

Lê ji bo ku xwe bihêz nîşan bide berê xwe da civîna NATO. 28’ê Hezîranê li paytexta Spanya Madrîdê civîna NATO pêk hat. Di navbera Tirkiye, Swêd, Fînland û Sekreteriya NATO de, li pişt deriyên girtî civîn hat lidarxistin.

Di vê civînê de, li ser dijminantiya Kurdan, Tirkiye peymana ku rê li ber endamtiya NATO’yê vedike imze kir. Bêbextiya dewletên Ewropa li vê derê xwe dubare kir. Berdêla erêkirina endamtiya 2 welatan de, dijminatiya herêma rojavayê Kurdistanê wek ku Erdogan dixwaze hat erêkirin.

Em gelek caran di nava xwe de suhbet û nîqaşen de dibêjin gelo piştî vê gefê wê êriş dest pê bikin? Heger xeta sor ya Rêber Apo baş were xwendin û nasandin wê bersiv were dîtin.



# “Em bi saya keda Rêbertiyê, şehîdan û berxwedana gerîla dijîn”

Têkildarî êriş û gefên dewleta tirkî ya dagîrker, Ebîr Elî Şîtî got, armanca êrişan parçekirina rojavayê Kurdistanê û derxistina şerê navxweyî ye.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Dîrok dibe şahida zilm û dagîrkeriya dewleta tirkî ya li dijî gelên azadîxwaz bi taybetî gelê Kurd. Dewleta tirkî ya dagîrker, bi plan û kiryarên xwe yê qirêj yên li ser gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, diyar dibe ku dixwaze bibe serdesta cîhanê tevê. Gelê bakur û rojhilatê Sûriyê, gelê azadîxwaz û bi taybetî gelê Kurd, li seranserê cîhanê, li hemberî gef, êriş û projeyên qirêj yên dewleta tirkî, çalakiyan li dar dixe.

Li ser mijarê endama Meclisa Jinan ya Kongreya Civaka Islama Demokratîk Ebîr Elî Şîtî, diyar kir ku dewleta tirk ya dagîrker, bi navê Ola Îslamê, rêbazê dijî mirovayiyê bi kar tîne. Ebîr axaftina xwe wiha domand: “Di demên dawî de dewleta tirk ya dagîrker êriş û gefên xwe li ser bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirin. Armanca wê ji vê yekê ew e ku aramî û ewlehiya herêmê tê bibe. Dewleta tirk bi kiryar û sûcên xwe yên qirêj, Ola Îslamê reş dike. Îslam nabêje dagîrkirina xakan, kuştina û revandina zarok, jin û mêran helale. Divê mirovê ku bi xapandinên dewleta tirk bandor bûne hişyar bibin û bizanibin ku ev lîske. Divê bibînin ku tiştê Erdoxan dike, bi ola Îslamê eleqedar nake.”

### `Armanc şkandina vîna gelê Kurd e`

Ebîr herwiha got, tişta ku dihêle dewleta tirkî evqas har û dîn bibe, hevgirtina gelên bakur û rojhlatê Sûriyê û îradeya gelê Kurd e. Ebîr Şîtî got, armanca dewleta tirkî ji van êrişan li ber çavê cîhanê tevê tê dîtin. Bi van gef û dagîrkirina xwe dixwaze vîna gelê Kurd bişkîne û Împaratoriya Osmanî vegerîne. Ji bo têkbirina van planan yekîtiya gelan pir girîn û pêwîst e.

Ji bo têkbirina planên dewleta tirkî Ebîr Şîtî wiha axivî: “Bila dewleta tirkî vê baş bizane ku çiqas êrişên xwe zêde bike, wê nikaribe vîna me bişkîne. Lewra em li ser soz û şopa şehîdên xwe ne ku bi saya wan em niha azad dijîn. Heta pêkanîna xewn û xeyalên şehîdan wê siyasetmedar di hevdîtinên xwe, hunermend bi dengê û mûzîka xwe, şervan bi çekên xwe û gel jî bi dengê xwe, li ber xwe bidin.”

### `Armanca komployê pêk nehat û wê pêk neyê`

Endama Meclisa Jinan ya Kongreya Civaka Islama Demokratîk Ebîr Elî Şîtî axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Armanca hêzên serdest ji komploya li dijî Rêber apo, qirkirina fikir û felsefeya azad û demokratîk bû.



Herwiha ji bo gel û Rêbertiyê ji hev qut bikin, bi salan e tecrîda giran li ser Rêbertiyê didin meşandin. Lê ew nizanin ku her mirovê aşiqê jiyanê azadiya xwe di fikir û felsefeya Rêbertiyê de dibîne. Ji berwê, wê ti hêzên serdest bi taybetî dewleta tirkî ya dagîrker, nikaribe me û rêberê gelan Abdullah Ocalan ji hev qut bike. Em bi saya keda Rêbertiyê, şehîdan û berxwedana gerîla li ser xaka xwe birûmet û azad dijîn.”

# `Emê li dijî êrişên dagîrkeriyê rêxistina xwe xurttir bikin`

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Welat Sadûn da zanîn ku armanca dagîrkeriya tirkî ji êrişan Neteweya Demokratîk û Rêveberiya Xweser e. Herwiha got emê li dijî êriş û balafirên dagîrkeriya Tirkan rêxistina xwe xurt bikin û parastina Neteweya Demokratîk bikin.**

Dewleta Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê ji Nîsana borî ve êrişên xwe li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirine û rojane gefên nû dixwe. Herwiha bi balafirên bêmirov û bombekirina bajar û gundewarê bakur û rojhilatê Sûriyê, kiryarên xwe yên hovane li dijî gelên herêmê didomîne. Rojane belafirên wê yên keşfê li asîmanê bakur û rojhilatê Sûriyê digerin û herêmê topbaran dikin.

Bikaranîna balafirên bêmirov û yên şer çi li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê û çi li dijî deverên din yên başûrê Kurdistanê, rojane dibe sedema mirina welatiyan. Di heman demê de siyasetmedar û rêveberên gelê Kurd û gelên din dikin amanc û bi vê jî zagonên navneteweyî binbê dikin.

Têkildarî mijarê endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk Welat Sadûn ji me re axivî û nêrînên xwe anîn ziman.

### `Tirkiyê hewl dide projeya dagîrkirina Kurdistanê berfireh bike`

Welat Sadûn da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe zêde kirine, zimanê xwe jî tûj kiriye û axaftina xwe wiha domand: “Êrîş û gefên dewleta tirkî ne nû ne, ji sala 2014’an ve êriş tên kirin. Destpêka şoreşê, piştî têkçûna peymana aştiyê ya di navbera PKK’ê û dewleta dagîrker de, Tirkiyê dest bi êrîşên xwe yên hovane li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir. Herwiha Ji bo avakirina `herêmeke ewle` li ser sînorê xwe, êrişî herêmên me dike û dixwaze armanca xwe li herêmê pêk pîne. Dema dawî êrişên xwe zêde kirine. Li kêleka wê jî gefan dixwe û hewl dide projeya xwe ya dagîrkeriya li ser Kurdistanê berfireh bike. Herwiha Tirkiye şerê Rûsya û Ukranya ji xwe re derfet dibîne.



Di demekê de ku cîhan tev bi şerê Ukranya ve mijûl e Tirkiye jî êrişên xwe li ser bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dike.”

### Armanc projeya Neteweya Demokratîk e

Welat got, armanca Tirkiyê Neteweya Demokratîk û Rêveberiya Xweser e û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Ji ber ku Rêveberiyeke Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin û bi hezaran kes tê de li ser fikrê Neteweya Demokratîk, Tirkiye êrîşî vê rêveberiyê dike û dixwaze destkeftî û serkeftinên wê têk bibe. Herwiha dixwaze gelê herêmê bitirsîne û bêhêvî bike û li ser hesabê wan xewna xwe ya Osamaniya berê vegerîne. Hêviya wê ew e ku di sedsaliya Lozanê de Osmaniya kevin vejîn bike û xwn û xeyalên xwe pêk bîne.”

### `Tirkiye bi balafirên xwe her kesî dike amanc`

Welat Sadûn diyar kir ku Tirkiye di hundirê xwe de pir lewaz bûye, ji ber wê nikare li ser erdê şerê me bike û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Dagîrkeriya tirkî di nava xwe de lawaz bûye, piraniya partiyên ku pê re kar dikirin, niha li dijî wê ne. Ji ber ku ji aliyê leşkerî siyasî û aborî ve lawaz bûye, nikare li hemberî me



şerê rûbirû bike. Ji bo wê jî dema dawî balafirên şer pir bi kar tîne. Bi balafirên xwe her kesî dike hedef. Rojane erebeyên siyasetmedaran û sivîlan topbaran dike. Herî dawî jî li bajarê Silêmaniyê yê Herêma Kurdistanê cîgirê Hevserokatiya Rêveberiya Xweser Ferhad Şiblî kir hedef. Di fikrê dewleta tirkî de wisa ye ku dema fermandarek dikeve tabûr tev dikeve, lê ew nizane ku dema fermandarek şehîd dikeve bi hezaran fermandar li ser şopa wî tên birêxistinkirin. Berî demekê jî Apê Yûsiv û her du neviyên wê kirin hedef. Tirkiye bê ferq û cûdayî êriş dike. Apê Yûsiv ne kesayeteke siyasî ne jî leşkerî bû, kesayeteke civakî û welatparêz bû.”

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk Welat Sadûn di dawiyê de got, wek Partiya Yekîtiya Demokratîk emê li dijî êrişan rêxistina xwe xurt bikin û parastina projeya Neteweya Demokratîk ya ku bi fîkir û felsefeya Rêber Abdulla Ocalan hatiye avakirin bikin. Herwiha bang li hêzên navneteweyî, bi taybet Rûsya û Emerîka kir ku balafirin şer yên Tikiyê li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê qedexe bikin û zexê li Tirkiyê bikin ku balafirên xwe bide sekinandin.

FENER



## Çi di civîna NATO de qewimî?

**Idrîs HENAN**

Ji 17ê Nîsanê û vir de şer û êrişeke bêeman bi ser Herêmên Parastina Medya ve tên meşandin. Dagîrkerên Kurdistanê, li gorî lihevkirineke nepenî, bi serperştiya faşîzma tirkî, hemleya tinebûna gelê Kurdî zindî kirine. Hemûyan hefsarê xwe radestî faşîzma tirkî ku nûner û berdevka wan ya Peymana Atlantîka Bakur e û ji êrişan re dev, guh û çavên xwe girtine.

Çendîn roj in dewleta faşîst a Tirkan dijberiya Swêd û Fînlandayê kir ku bi awayekî gelek beloq daxwziyên “qebedayên koşe û ziqaqên teng” jê dikirin. Bi cilên dîplomsiyeke xwînmij, bazara endamtiya wan her du welatên navborî ya nava NATO’yê dikir. Heyameke wisa bû ku rojane li çiyayên Kurdistanê derbên mirinê dixwe, nedizanî çawa xwe jê bifiltîne. Her çiqas belaya xwe li Amerîka û Rûsyayê dabe ku destûrnameya êrişeke “xilasker” bistîne û xwe ji tengezariyên ku li Herêmên Parastina Medyayê dikişînê xilas bike, bê encam man.

Lê ji ber ku “çeripîna” kilîtê lê teng dibûn û êdî di nav tunelên Gerîlayên Azadiyê de li ber lingan diçûn, bi rijd bû ku atmosfera şerê Rûsya û Ukranyayê afirnadiye, weke firsenda dawî, bi kar bîne û aloziya ku bêhn lê çikandiye, qederekê derbas bike. Jixwe, çendîn dîmenên ku vê pêxîrtengiya faşîzma tirkî li çiyayên Kurdistanê isbat dikin kêm bin jî, lê yên hene jî têrê dikin ku virr û derewên rojane li ser civakê dike bicerisînin. Her tişta bi civakê re parve kiriye derew e. Çi gotiye û çi kiriye, berovajî wê rast e. Ji lew re, daxwaznamyên Swêd û Fînlandayê yên endamtiya NATO’yê firsendek dîrokî ji faşîzma tirkî re bûn.

Piştî civîna sêalî (Tirkiyê, Swêd û Fînlande) ya bi koordîneya Sekreterê Giştî yê NATO’yê Stoltenberg, a 28 Hezîranê li Spanyayê, Erdogan serkeftina xwe ragihand û tevahî alavên ragihandina tirkî ketin nava tevgerê û tenê hevoka “em bi ser ketin” dubare kirin. Jixwe tişta bûye ne serkeftin, derbkirina nirxên demokrasiyê bû. Axaftina Serokwezîra Swêdê piştî civînê, vê yekê baş îfade dike, teybet dema ku dibêje: “Zagonên me yên terorê di 30 salên dawî de, di guhertinên mezin re derbas dibin. Herwiha ji bo ku tevlêbûna nava rêxistina terorê weke sûc bê dîtin wê di Destûra Bingehî de guherîn bê çêkirin.”

Ev rastiya NATO ye. Ew sazî li ser bingeha şer û mêtingeriyê hatiye avakirin. Jixwe, welidînek şerê cîhanê yê duyemîn bû. Di bineya wê de tiştek bi navê nirx, azadî, demokrasî û mirovatî nîne. Her tişt berjewendî ye. Qezenc û zirar e. Serokê Amerîka Joe Biden ev yek eşkere got; civînê mohra xwe li dîrokê xistiye û hemû Ewrûpa bû NATO. Yanê tam berovajî bendewariyên Rûsya bû. Li gorî Biden; Serokê Rûsya dixwest hemû Ewrûpa bike weke Fînlandayê. Yanê li hemberî geşedanên mêtingerî û pêşbirka desthilatdariyê di pozisyona bêalîbûnê de bin. Ev yek diyar dike ku navenda hegemoniyê hîna di wê israra xwe ya yekblokê de ye. Eger Swêd û Fînlanda bermahî û hêviyên demokrasiya Ewrûpa bûn, ew jî têk birin û xistin nava qirêjiya xwe. Tirkiyê û Erdogan amûrên vê lîstikê bûn.

Jixwe yek peyama civîna Madrîdê ya NATO’ê hebû, ew jî lihevkirina li ser polîtîkayên qirkirinê yên li dijî têkoşîna gelan û senteza azadîxwaz a Tevgera Azadiyê ye. Bi piştgirî û sazûmankirina vê itîfaqê re, siyasetên îmha, înkar û qirkirinê yên li ser têkoşîna gelê Kurd tên meşandin, hatin erêkirin û mixa dawî li darbesta demokrasiya Ewrûpa xistin. Lê ji ber ku hişmendiya azadî û demokrasiyê ya ku îro bi pêşengiya têkoşîna Kurdan zindî maye, wê gelên azadîxwaz, bi rêxistinbûn û têkoşîna xwe ya bê mînak, demokrasiyê zindî bikin û nirxên gelan biparêzin. Çendîn piştgiriya ji faşîzma tirkî re zêde bibe, dê nikaribe pêşî li têkçûna wê li hemberî têkoşîna azadiyê bigire. Bi gotineke hê gelêrî; çiqas Erdogan Tirkiyê li dû bêhna kebabê ketibin, wê rastî daxkirina lingê kerê werin.